

Em We Gazî Federosyonê Dikin

Federasyona Şoreşger ya Anarşîst

Em We Gazî Federosyonê Dikin



"Da ku şerê afirandina cîhaneke azad mezin bikin, geş bikin... Em gazî hemû kesan dikin ku tevli şerê azadiyê bibin. Da ku ya me bi deyn hilgirtî dîsa bidin. Da ku tovên anarşîzmê li Meropotamyayê, li Anatolyayê û li Trakyayê biçînin. Em we gazî Federosyonê dikin."

Federasyona Şoreşger ya Anarşîst

02.04.2021

Anarşîzm, têkoşîna azadiyê ye, ya ku ji du sed salan heta niha didome. Anarşîzm, di tîkiliyên mirovan û desthilatdaran de, li dijî dewletên dijminên gelan û li dijî kapîtalîzmê berxwedanek e. Dîroka cîhana ku bi sîstema dewletan tê birêvebirin pênc hezar salî ye. Lê dîrok û bîngeha anarşîzmê digêhîje sed hezar sal berî niha. Anarşîzm wê bi rastiya vê hêzê erka desthilatdaran tîk bibe û wê jiyaneke bêyî desthilatdarî ava bike; ji bo azadiyê û dadê.

Em 12 salin, li ser vî erdnigariyê şoreşa anarşîst nexşe û nexşe girê didin. Em dibêjin, anarşîzm rêxistin e. Me gotina xwe bi çalakî pêk anî. Em rêxistineke anarşîst pêngav bi pêngav dirêsin. Li şûna xwehezkirin û reqabeta li ser mirovahiyê tê şert kirin, em parvekirinê û hevgerîna diparêzin. Li şûna itaetê em serhildanê diparêzin. Em hêviyê ji tirsê rizgar dikin û bi cesaretek mezin diçin li ser tirsê.

Şerê me li gel dewletê ye. Dewlet bê dadî ye. Emê vî bê edaletiyê xilas bikin. Em Ermenî ne, em Kurd in, em Laz in... Em ne kêmjimarî; pirin, zêde ne. Em gelên ku bi dewletê re rû bi rû man in. Em gelên hatin qetil kirin in. Şerê me li gel kapîtalîzmê ye. Em karkerin; şerê me li gel patronan e. Û şerê her karkerekê şerê me ye. Şerê me li gel patriyarkayê ye. Em jin in, şerê me li gel zilamiyê ye. Em li dijî rengê zilamiyê yê tarî, rengê keskesorê in. Em pêkhatina daristanan ya li gel çeman, pêkhatina şêran ya li gel xezalan in. Şerê me li gel kapîtalîzma jiyana ekolojîk tîk dibe ye. Em ciwanên ku ji bo azadiyê li dijî êsîriyê ne. Em bi hêza ciwaniya xwe dikevin qada şer. Em Şoreşgerên Anarşîst kûçe bi kûçe, tax bi tax, ji zarokan heta pîran rêxistana anarşîzmê dikin.

Em din av şer de ne. Û di vî şerî de em hisaba pêşî û paşî nakin. Em mijaran cûda nagirin. Me şerê xwe wisa rêçand. Anarşîzm roj bi roj rêxistina xwe li ser vî erdnigariyê xurttir dike. Em li deverên cûda tîkiliyên xwe bi hêz dikin, bi hêztir dibin. Niha rastiya ku 12 salan anî pêşiya me li pêş çavên me ye.

Rêxistinên me yên li Enqerê û Stenbolê êdî tîra mezinahiya me nake. Em dizanin ku emê li deverên cûda jî vî pîrsgerîkê bijîn. Xebatên me yên anarşîst hewceyî tîkiliyên xurttir in. Da ku em şerê xwe bi hêztir û berfirehtir bikin hewcedariya me bi tîkiliyên federatîf heye. Federasyonên ku du sed salin li erdnigariyên cûda de berxwe didin vî yeke nîşanî me didin. Belê, rastiya kû em îro rû bi rû mayî, federasyon e.

Em, Ciwanên Anarşîst (Anarşîst Gençlik), Karala, Xebatên Şoreşger yên Anarşîst (Devrimci Anarşîst Faaliyet DAF), Xebatên Anarşîst yên Lîseyan (Lise Anarşîst Faaliyet) û Rojnameya Meydan dibêjin ku emê ji niha û pê de xebatên xwe li ser navê Federasyona Şoreşger ya Anarşîst bidomînin. Da ku şerê afirandina cîhanê azad mezin bikin, geş bikin... Em gazî hemû kesan dikin ku tevî şerê azadiyê bibin. Da ku ya me bi deyn hilgirtî dîsa bidin. Da ku tovên anarşîzmê li Mezopotamyayê, li Anatolyayê û li Trakyayê biçînin. Em we gazî Federasyonê dikin.

Anarşist Kütüphane



Federasyona Şoreşger ya Anarşist
Em We Gazî Federasyonê Dikin
02.04.2021

03.04.2021 tarihinde anarsistfederasyon.org 'den alındı.
Em gazî hemû kesên dîkin ku tevli şerê azadiyê bibin. Da ku ya me bi deyn hilgirtî dîsa bidin. Da ku
tovên anarşîzmê li Meropotamyayê, li Anatolyayê û li Trakyayê biçînin. Em we gazî Federasyonê dîkin.

tr.anarchistlibraries.net